Kehet (Girê Berî)

kehet (Girê Berî) li rexê rojhilatê çemê Ceqceq ê ku çemek ji çemê Xabûr re û nêzî Girê birak ê şûnwarî; dikeve. Ev gir dûrî bajarê Hesekê bi 40 km ji aliyê bakurê rojhilat ve û 34 km dûrî bajarê Qamişlo ji aliyê başûrê rojava ve dikeve .

Girê Berî ji cihên şûnwarî yên girîng e di hirêma Xabûr de ye. di dîroka xwe de cihekî stiratîjî girîng standibû û ji bo wilo bûbû girêkek veguhastinê di navbera beravên Deriya Spî, Babile û Bajarê Xatî de.

Gir rûberek digihêje 37 Hêktaran; saz dibe. (7 Hêktar rûbera parçeyê jorîn e (akropol) û 30 Hêktar rûbera parçeyê nizim e) û ji deşta derdora xwe bi 32 M bilintir e.

Despêka nişstecihbûna li cihê şûnwariyê vedigere qonaxa Helef. Nişstecihbûn piştî wê demê di qonaxa Orok û despêka bereyên yekemîn de; berdewamkir.

Di nîvê hezarsala duyan de b.z padîşahiya Hûrî-Mîtanî hat sazkirin. Waşokanî (Tel Fêxiriyê) ji xwe re kir paytext, berî ku desthilatdariyê li piraniya herêmên rojhilata kevin pêk bîne. Di vê demê de hêza Kehet pir mezin bû her wiha rola wê jî mezin bû, ta ku bû yek ji bajarên padîşahî yên herî mezin di nava her du sedsalên 14-15 b.z de.

Di têblêtek Mîxî de ya ku li Marî hatiye derpêçkirin, perestgehek tevî hemû pîvanên wê ya ku vedigere dema Mîtaniyan û tê de hate gotin ku ev perestgeh ji bo xwedawendê Hûriyan Tîşob (xwedawendê av û bayê) her wiha tê de behsa pişkeweyekê ji hevpeymana navnetewî di navbera şahê Hîtîtî (Shubilioliuma) û şahê Mîtaniyan (Shattiwaza) yê ku di vê perestgehê de hatiye veşartin.

Di dawiya çerxa çardan de b.z Kehet ket bin desthilatdariya dewleta Asûriyan di dema şah Adad Nîrarî di sala (1273-1304) b.z. pişter nişstecihbûn di vî cihî de ta qonaxa îslamî de jî; berdewam kir.

Lêkolîn: lêkolîn di vî cihî de ji sala 1980 de li ser destê şandeya Îtalî bi rêveberiya lêkolîner Paolo Îmîli'o Pîkorêla; dest pê kir, di van lêkolînan de sera, perestgeh û şûnwariyên cuda yên ku dîroka wan vedigere hezarsala pêncan b.z; hatin derpêçkirin.

lempeya zeytê ya ku dîroka wê vedigere qonaxa Helnestî (çerxa sisyan b.z)

xilikek ji terzê Nûzî ku vedigere dema Hûrî-Mîtanî.

Komikek ji xilikên ku vedigerin dema Asûriyan a navîn.